Ser ke coşêkî nebê min zirke talim bo çîye
Berhemî: Mehwî (1836-1906)
Le kitêbî: *Dîwanî Mehwî*

Ser ke coşêkî nebê, min zirke talim bo çîye!
Dil ke hoşêkî nebê şîşey betalim bo çîye!

Derd û daxêkî derûnî ger bibê, ba reng û rû
Sîs û muxber bê, kemalim bû cemalim bo çîye!

Tecrebey aşiq be sûtanî dekird ew zalime
Seyrî ken êsta delê: mişтê zuxalim bo çîye!

Pêyî be serma na ke bûme xakî rêy, gerdim şukir
Geyîye dawênî, delalî bay şemalim bo çîye!

Daxî sîne û pêç û tabî dûdî ahim xo heye
Mor û turrey înperator û qeralim bo çîye!

Xelq ewa mecbûrî dû xoxistinî xelqin be can
Min be dil menfûrime, rutbey cecalim bo çîye!

Male pîtkênêye mal û geyne halî xoye hal
Min ke wa halî bim, îtir mal û halim bo çîye!

Pir be pê zincîrî şêtî, daxî sewda pir be ser
Seyrî halî xome, seyrî zulf û xalim bo çîye!

Derdedar elbet zubanî derd û hesiret tê dega
Çawî bîmarî dezanê, nale nalim bo çîye!

Dil gile û şekwey le eşkencey ezabî zulfî yar
Kird û ew fermûy: ey zincîrî zalim bo çîye!

Hale bedhalî le şwên û male wêranî le dû
Mehuya! ger ehlî halî, hal û malim bo çîye!

Serçawe: saytî Vejîn
https://books.vejin.net/ck/text/494?h=%D8%AC%DB%86%D8%B4%DB%8E%DA%A9%DB%8C

https://www.youtube.com/watch?v=BJpouw_qso4